Kurdistan
Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (229) | Îlon / 15-9-2022

# Kêmbûna ava paqij û metirsiyên Kolêra



**Dilovan Ehmed**

Ev demeke nexweşiya Kolêra li hejmareke bajarên Sûriyê di nav de bajarên Kurdî belav bûye, û hejmareke kesan jî jiyana xwe jidest dane, û ev yek jî metirsiyeke mezine li ser jiyana welatiyan. Neteweyên Yekgirtî hişyarî da, û regehand ew ji vê yekê dûdil in ji ber ku sîstema tendirustî li Sûriyê wêran bûye. Peyvdarê Sekretêrê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî Stéphane Dujarric got: nexweşên Kolêra li Sûriyê zêde dibin, û pêwîste di zûtirîn dem de alîkariyên pizişkî werin şandin, û dazanîn, ev nexweşî li ser jiyana xelkê Sûriyê gef e. Herwiha her yek ji Hikûmeta Sûriyê û çavkaniyên navxwe hejmar û amarên cuda belav dikin. Pizîşkek ku nexwest navê xwe eşkere bike got, ev nexweşî ji ava pîs çê dibe, û pêwîste welatiyên me xwe biparêzin, û ji xwarinên gemar dûr bikevin, demeke ev nexweşî heye, lê niha hatiye ragehandin, divê aliyên peywendîdar bi erkê xwe rabin, û vê nexweşiyê piştguh nekin, heta ku ji kontrolê dernekeve.

Welatiyek dibêje, nebûna ava paqij taybet li Hesekê û gundewarê wê sedema sereke ji belavbûna Kolêra re ye, pêwîste çareseriyek ji pirsgirêka avê re were dîtin.

## Birîna daran li Efrînê berdewam e

Birîna daran li Efrînê hêj berdewame, û ev yek jî dilgiranî û karvedaneke zêde li pey xwe ve aniye, lewma Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS qutkirina dar û daristanên Efrînê ji aliyê grûpên çekdaran ve şermezar dike û bang li civaka navdewletî û rêxistinên mafên mirovan dike ku destwerdanê bikin û van tawanan rawestînin. ENKSê di daxuyaniya xwe de ragihand: "Binpêkirinên tirsnak li dijî nişteciyên herêma Efrînê û sirûşta wê, ji aliyê grûpên çekdar ve bêyî nirxên exlaqî didomin.

*Rûpel—2*

## Şoreşa Îlonê, şoreşeke seranserî bû


Şoreşa mezin a Îlonê ya bi rêberiya Barzaniyê Nemir e, şoreşeke seranserî bû û çendîn destkeftên neteweyî û niştimanî ji bo gelê Kurdistanê pêk anîn, bi taybetî rêkeftina dîrokî ya 11ê Adarê, ku rejîma Be'sê neçar ma, hinek mafên neteweyî yên xelkê Kurdistanê qebûl bike.

*Rûpel—3*

## "Ferhenga Dêrşewî" hat çapkirin

Ferhenga Dêrşewî ji 1137 rûpelan û zêdeyî 250 hezar gotinan pêk tê. Rojnameya Kurdistan li ser vê ferhengê hevpeyvînek ligel wî encam daye.Nivîskarê ferhengê Bêwar Dêrşewî ji Rojnameya Kurdistan re dibêje" Ferheng ji zaravayên sereke û ji gelek devokên xwecihî pêk tê, gelek navên şûnwaran û navdaran û gund û hozan têde hene, herwiha gotinên Somerî jî tevlî bûne.

*Rûpel—4*



# «Birîna daran li Efrînê karekî ne exlaqî ye»

Kurdistan

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS qutkirina dar û daristanên Efrînê ji aliyê grûpên çekdaran ve şermezar dike û bang li civaka navdewletî û rêxistinên mafên mirovan dike ku destwerdanê bikin û van tawanan rawestînin.

> **Pêwîste sînorek ji kiryarên çekdaran re bê danîn**


ENKSê di daxuyaniya xwe de ragihand: “Binpêkirinên tirsnak li dijî niştecîyên herêma Efrînê û sirûşta wê, ji aliyê grûpên çekdar ve bêyî nirxên exlaqî didomin. Ev grûpên çekdar çend roj berê, bi sedan hektar dar li nahiyeyên Cindirês û Meydankê û gundên derdor qut kirin, ku ev nîşaneya çanda wan a werankirina şirûştê ye.”


Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS diyar kir ku ew van kiryarên ne exlaqî, bi tundî şermezar dikin û got: “Em bang li civaka navdewletî û rêxistinên mafên mirovan dikin ku destwerdanê bikin û van tawanan rawestînin û em bang li dewleta Tirkiyê dikin, ji ber ku herêmê kontrol dike, herêmê biparêzin û hesabê ji tawanbaran bixwazin.”

Herwiha ENKS daxwaz ji Îtîlafê jî dike ku bi erkê xwe yê niştimanî û exlaqî rabe, van kiryar û tawanan şermezar bike û tawanbaran bide dadgehê.

Çalakvanên Efrînê girtevîdyoyek li tora civakî belav kirin, tê de diyar dibe hejmarek kes darên li derdora gola Meydanekê ya Efrînê dibirin û li barhilgirekê bar dikin û didizin.

> **Şewtandin û birîna daran tawan e**





Li gorî çalakvanan, kesên ku di vîdyoyê de diyar dibin û daran qut dikin, ser bi grûpa çekdar “Sultan Murad” ve ne. Qutkirina dar û daristanan ji aliyê grûpên çekdaran ve, karvedan û hêrseke mezin li tora civakî li pişt xwe anî.

Çalakvanên Efrînê dîmenên daristanên Efrînê yên berî û piştî dagîrkirina wê ji aliyê artêşa Tirkiyê û grûpên çekdar ve belav kirin û diyar kirin ku piştî dagîrkirina Efrînê, gelek daristan nemane.

# Rêjeya tawanan li Efrînê zêde bûne

Kurdistan

Li Efrînê, rêjeya tawan, girtin, revandin, bombebarankirin, kuştinê ji aliyê grûpên çekdar ve zêde bûne. Li gor raporteke rêxistineke belgekirina binpêkirinên mirovî, ji destpêka sala 2022an ve, 530 kes li Efrînê hatine revandin.

Navenda Belgekirina Binpêkirinan di raporteke de belav kir, grûpên çekdar guh nadin bangên rawestandina binpêkirinên mirovî û rojane ji bo standina fidyê xelkê Efrînê direvînin. Destnîşan dike, hemû haletên revandinê, ne li ser bingeha fermanên dadwerî yên Dozgerê Giştî ne ku piraniya wan bi awayekî neyasayî û keyfî têne kirin. Pêwendî bi piraniya revandiyan nayê kirin û çarenivîsa wan nayin zanîn.

Navenda Belgekirina Binpêkirinan tekez dike jî, piraniya tohmetên ku arasteyî girtiyan tên kirin, ne li gorî belge û delîlan in, lê ji ber sedemên kînê ne. Navenda Belgekirina Binpêkirinan diyar dike, wan ji destpêka sala 2022an ve karîne navên 530 revandiyan belge bikin, lê hejmara rastî ya revandiyan ji vê zêdetir e. Da zanîn jî, Talankirina bi awayekî sîstematîk, ferzkirina bacan, destdanîna ser mal û milkên xelkê, dizîna zeytûnan, birîna dar û daristanan, revandina welatiyan bi awayekî keyfî û çewsandina xelkê li Efrînê, bûye diyardeyeke rojane. Li gorî amarên wê navendê, Ji destpêka êrîşa Tirkiyê li ser navçeyên Kurdî û heta niha, 2 hezar û 659 kes hatine kuştin, 6200 kes birîndar bûne, hejmara girtî û revandiyan gihîştiye 8 hezar û 530 kesan, ji wan 6 hezar û 259 kes hatine azadkirin, yên mayî jî çarenivîsa wan ne diyar e. her wiha hejmara kesên li girtîgehan di bin eşkenceyê de hatin kuştin jî gihîştiye 177 kesan.



# Şoreşa Îlonê şoreşa destkeftan bû

Kurdistan

Di salvegera Şoreşa Îlonê de, Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S nameyek aresteyî serok Mesûd Barzanî, serkirdayetî, endam û kadirên Partiya Demokrata Kurdistanê PDKê kir, têde pîrozbahiyên germ bi navê Komîteya Navendî ya PDK-Sê, heval û alîgirîn wê, di vê roja pîroz di dîroka Kurdî de pêşkêş kirin.


> Şoreşa Îlonê şoreşa hemû Kurdistaniyan bû

PDK-S di nameya xwe de wiha dibêje: Rêber Barzaniyê nemir di bicîkirina têgehên Şoreşa Îlonê de biser ket, vîna xwe ji rewanê berxwedana Pêşmergeyên Kurdistanê bir, bi her karîn û şiyanekê kar kir ku rewatiya gel bilind bihêle, hişt ku ew şoreş bibe şoreşek ji hemû Kurdistaniyan re, bi wê yekê jî Şoreşa Îlonê di serdema niha de, yek ji nîşanên herî bilind ji her serkeftinekê re ye, ku Kurdan bi dest xwe ve xistine, cihê xwe digire.

PDK-S, da zanîn ku Şoreşa Îlonê her çîn û pêkhateyek li xwe girtin, li dora şoreşê kom bûn, bi hezaran ji ciwanên Kurdistanê tevlî bûn, ji ber ku şoreşek bû hemû wate û nirxên wefadarî û sozdariyê ji bo berjewendiyên bilind ên gelê Kurd têde hebûn, û bû rûpelek herî bi ronî, di dîroka gelê Kurd de, ya ku ji bo serbestî û azadiyê tekoşîn û xebat dikirin, bi saya vê şoreşê Kurdan serkeftin û deskeftiyên mezin li ser her astekê bi dest xwe ve xistin weke rêkeftina 11ê Adara 1970ê, ku dan bi otonomiyekê ji Kurdan hat kirin, û di destûra Iraqê de di wê demê hat nivîsandin û çespandin. PDK-Sê ameje pê kir ku ew di wê baweriyê de ne ku emanet û prensîpên Şoreşa Îlonê di destê wefadar birêz Serokê Mesûd Barzanî de ye, niha Kurdistan bûye qublet û berêdana her Kurdistanyekî, Hewlêr jî bûye cihê xwelêgirtina cîhanî bi taybet aliyên Iraqî, nexasim di dema milmilanî, girjî û nakokiyan de, berê xwe didin Hewlêra paytext û bi rêzdarî guh li şîret û gotinên serok di dîtina çareseriyan digirin.

> Destkeftên Kurdan ji derencamên vê şoreşê bûn

Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya careke din di nameya xwe de pîrozbahî pêşkêş kirin û silavên germ ji rêberê Şoreşa Îlonê Barzaniyê nemir, ruhê pakrewanên şoreşê û Pêşmergeyên leheng û qehreman re şandin, ragihand ku ewê li ser prensîpên dibistana Kurdayetî û rêbaza ku li ser destê Barzaniyê nemir bingeh û stûn jê re hatine danîn, kar û xebatê xwe Berdewam bikin.



### Şoreşa Îlonê

Şoreşa mezin a Îlonê ya bi rêberiya Barzaniyê Nemir e, şoreşeke seranserî bû û çendîn destkeftên netewî û niştîmanî ji bo gelê Kurdistanê pêk anîn, bi taybetî rêkeftina dîrokî ya 11ê Adarê, ku rejîma Be'sê neçar ma, hinek mafên netewî yên xelkê Kurdistanê qebûl bike. Piştî ku Serokwezîrê wê demê yê Iraqê Ebdulkerîm Qasim, Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) wek partiyeke eşkere û yasayî betal kir û ji sozên xwe yên li ser mafên Kurdan di çarçoveya Iraqê de vegeriya, Kurd bi neçarî dest bi xebata siyasî ya nepenî û xebata çekdarî kir, Şoreşa Îlonê bi rêberiya Mela Mistefa Barzanî di 11ê Îlona 1961ê de hat ragihandin. Xebata serdema Şoreşa Îlonê dijwar bû, cîhan du alî bû ji aliyê her du welatên zilhêz Amerîka û Sovyetê ve, lê belê şoreşa Kurdan şoreşeke mezin bû. Pir wext derbas nebû ku şoreş ji Xaneqînê gihişt heta Zaxo. Kurd hemû ji bo qubanîdanê amade bû, roj bi roj baweriya xelkê bi Barzanî û şoreşê bihêztir dibû. Yekem berhema vê şoreşê ku di dîrokê de hatiye nivîsandin, rêkeftina 11ê Adara 1970ê bû, ku gotûbêjên sala 1991ê jî ligel desthilata Bexdayê, li ser bingeha wê rêkeftinê bû. Beriya destpêkirina şoreşê, Kurd dihatin çewisandin û ti mafekî wan ê netewî tunebû, mafê xwendina bi zimanê Kurdî tunebû. Nikaribûn şanazî bi nasnameya xwe bikin. Iraq ji qebûlkirina mafên ku di dema damezrandina sîstema komarî de pejirandibû, vegeriya. Rêkeftina Cezayîrê ya 6ê Adara 1975an, mezinbûna Şoreşa Îlonê derxist holê, ku desthilatdarên Iraqê bi tenê nedikariyan şoreşê têk bibin û dawîli xebata Kurd a ji bo gihiştina mafên xwe bînin. Niha Serok Mesûd Barzanî xebata bidestxistina armancên ku bavê wî Mela Mistefa Barzanî dabû destpêkirin, didomîne. Hemû şiyanên xwe ji bo gihiştina encama ezmûna Kurdistanê û pêşvebirina demokrasî û parastina pêkvejiyana olî û netewî û garantîkirina mafên Kurdan bi karî tîne, heta wê roja ku Kurdistan bigihîje serxwebûnê.

# Bêwar Dêrşewî: Ferheng nasnameya miletekî ye

Kurdistan-Soz Xelîl

Piştî 14 salan ji kar Bêwar Dêrşewî ferhengeke Kurdî-Erebî bi navê "Ferhenga Dêrşewî" çap kir. Ferhenga Dêrşewî ku ji 1137 rûpelan û zêdeyî 250 hezar gotinan pêk tê. Rojnameya Kurdistan li ser vê ferhengê hevpeyvînek ligel wî encam daye.

***Em dixwazin tu behsa naveroka ferhenga xwe bikî?**

Ferheng ji zaravayên sereke û ji gelek devokên xwecihî pêk tê, gelek navên şûnwaran û navdaran û gund û hozan têde hene, herwiha gotinên Somerî jî tevlî bûne.

***Zehmetiyên hatine pêşiya te çi bûn?**

Zehmetî ji hemû aliyan ve hebûn, ji ber berpirsyariyeke pirr mezine çaxê hebûn û nasnama neteweKî tu tomar dikî, ta tu bighê koka gotinan, helbet ji bo berhevkirina ferhengan jêder û pêzanînên dirust û rêziman giring e, û pêwîstiya te bi geryana meydanî jî heye, çi li Bakur, Başûr û Rojava ez baş geriyam, û min guhdariya xelkê kir.

***Gelek ferhengên din hene, çi taybetmendiya vê ferhengê ye?**

Taybetmendiya wê, min Zimanê Kurdî gelekî dewlemendtir kiriye beramber zimanekî serdest ango Erebî, berûvajî van ferhengên din, gelek ferheng hene lawaz in, lê rêza min bo hemû ferheng û berhevkarên wan re heye, bê guman ew jî bo min bûn çavkanî û jêder, dubare min zarave û devok nêzî hevkirine.

***Ev ferheng li cem te çi ye?**

Ferheng, nasname û guzarnama netewî ye. Ferheng nahêle çanda miletan hilweşe û zindî dihêle, ji ber nifş radestî nifşên din dike, û wisa berdewam dike.

***Tu rewşa Zimanê Kurdî çawa dibînî?**

Sîstema Zimanê Kurdî weke dîtin û şopandina min baş nîne, ev çend sal in, em ta radeyekê azad in, lê li Başûrê welat hêj ne zelale, û zaravek ser kîsê zaravekî sereke bi kar tê, bê guman ev bandora konevaniyê ye, herwiha li Rojava jî sîstem wisya ye, em dikarin bibêjin qazinceke wisa me bidest nexistiye, dibe hinek gavên biçûk û şermok hatibine avêtin, lê wê têra fêrkirinê di dibistanan de neke.

***Jibilî vê ferhengê, çi berhemên te yên din hene?**

"Jîn û Dad" Dîwana helbestê ye, di destpêka 2000an de çap bibû û berhema din "Dastana Lavij" di sala 2012an de, ew pîkoleke dîrokî ye li ser straneke gelêrî bû, lê bûyer ji stranê kûrtirbû, ez tevlî şoreşa Mihemed Paşayê Riwandizî kirim.

***Em dixwazin hinekî tu behsa jiyana xwe bikî, Bêwar Dêrşewî kî ye?**

Em jî wek hemû malbatên Kurdan penaber bûne ji serxetê derbasî binxet û başûr bûne, lê zarokatiya min li Dêrika Hemko derbas bûye û nêzî 20 salan min karê wênegiriyê kiriye, û gelek stranên min berhev kirine hatine gotin.




# 38 sal in sînemakar Yilmaz Guney jinav me bar kiriye

Kurdistan

38emîn salvegera koça dawî ya sînemakar, hunermend û şoreşgerê Kurd Yilmaz Guney e. Guney ji ber darbeya 1980ê ya Tirkiyê ji hemwelatiya Tirkiyê hatibû derxistin û ew koçberî paytexta Fransa bajarê Parîs bûbû û li wê derê koça dawî kiribû û cenazeyê wî li wir bo axê hatiye spartin. Yilmaz Guney di sala 1937an de li gundê Yenîceyê ya bajarê Edenêyê ji dayik bûye. Ew yek ji 7 zarokên malbateke karker e, bi eslê xwe Kurd e. Guney dibistana seretayî û ya navîn li Edeneyê xwendiye. Ew hêj di 9 saliya xwe de dibe karker û dest bi karê komkirina pembo dike. Lê dest ji xwendinê jî bernade. Li Enqerê zanîngeha hiqûqê dixwîne û li Stenbolê jî beşa aborî. Di salên xwendinê de çîrokan û senaryoyan dinivîse. Ew li ser trajedî û drama gelê xwe radiweste. Di dema xwendina xwe de senarîstê Tirk Atif Yilmaz nas dike. Di sala 1957ê de dadgehê ji ber karên siyasî derbarê wî de 7 sal û nîv cezayê zîndanê û 2 sal û nîv jî cezayê mişextê birî. Dadgeha temyîzê biryarê hildiweşîne dike sal û nîvek zîndan û 6 meh jî cezaya mişextê. Yilmaz Guney ji ber vê sedemê dibistanê naqedîne. Guney dibêje "Dibistana min pirtûk in, sînema ye, girtîgeh e, qanûnên jiyanê yên tund in, zextên civakî ne, xayîntî ye û mêrxasî ye. Mamosteyê min jî jiyan e." Wî di navbera salên 1957 û 82ê bi dehan fîlm amadekirin û di dehan fîlman de jî beşdarî kir. Ew, di sala 1972an de careke din bi sedema ku tevlî bûyerên sîyasî bûye tê girtin û 2 sal li girtîgehê dimîne û paşê serbest tê berdan. Yilmaz Guney, di 9 îlona 1984an de, hêj 47 salî, li Fransayê koça dawî kir. Derhêner û sînemakarê Kurd di jiyana xwe ya hunerê de gelek berhemên giranbuha li dû xwe hişt. Wî di fîlmên xwe de, bal kişand ser tengezariyên jiyana gelê Kurd. Fîlma Yilmaz Guney a bi navê Yol (Rê) jî yek ji van berhema ye. Rê, di sala 1982an de, bi fîlma 'Wenda' ya rejîsorê Yûnanî Costa Gavras re, xelata Palmiyeya Zêrîn parvekiribû. Yilmaz Guney, berî mirina xwe di axaftineke xwe de li ser rewşa Kurdan û Kurdistanê wiha gotibû: "Em vê qederê red dikin! Em naxwazin bibin zarokên welatekî bindest ê ku ji çar aliyan ve hatiye dagirkirin; em dixwazin bibin zarokên welatekî azad, serbixwe û yekgirtî. Em dixwazin li ser axa xwe, bi zimanê xwe stranên evînê û azadîyê bibêjin. Û em dixwazin li warê xwe, li bin alaya xwe, azad û serbixwe bijîn."

